PAPER DETAILS

TITLE: Çîrokên Werger Ên Mela Mehmûdê Bazîdî (1797-1870)

AUTHORS: Mustafa ÖZTÜRK

PAGES: 33-63

ORIGINAL PDF URL: https://dergipark.org.tr/tr/download/article-file/618379

Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi
Yıl: 4, Cilt: 4, Sayı: 8, 2018/2, ss. 33-63

ÇÎROKÊN WERGER ÊN MELA MEHMÛDÊ BAZÎDÎ (1797-1870) (VEKOLÎN-METN)

Mela Mahmud Bazidi's Translated Stories (Review-Text)

Mustafa ÖZTÜRK[1]

Kurte

Mela Mehmûdê Bazîdî wekî zanyarekî Kurd, xwedîyê ked û berhemên girîng in di gelek qadên ji hev cuda de. Bazîdî di berhevkarîya folklorê, istînsaxa destxetên Kurdî, nivîskarîya berhemên cûrbicûr, rêzimannasî, civaknasî û hwd de gelek xebat pêk anîne. Qadeke din ya ku Bazîdî bi wê re mijûldar bûye jî wergernasî ye.

Di Koleksîyona Aleksandre Jaba de destnivîsa bi hejmara Kurd 43'yê ji 84 çîrokên Farsî û wergerên wan ên Kurmancî û Fransî pêk tê. Wergerên Kurmancî ji alîyê Mela Mehmûdê Bazîdî ve û yên Fransî jî ji alîyê A. Jaba ve hatine kirin. Ev çîrokên ku dikarin li ser qada edebiyata klasîk bên hesibandin, li gorî agahîyên berdest, nimûneyên ewil ên çîroka pexşan a Kurdî ya klasîk in. Di vê xebatê de ewilî li ser çîroka klasîk bi gişt û taybetîyên destnivîsa Kurd 43'yê hatîye rawestan û piştre jî tîpguhêzîya destnivîsê ya Kurmancî hatîye dayin.

Peyvên Sereke: Mela Mehmûdê Bazîdî, Aleksandre Jaba, Edebiyata Klasîk, Farsî, Kurmancî, Werger, Çîrok.

Abstract

Mela Mahmud Bazidi, who was a Kurdish scholar, created important works in various fields. Bazidi produced works in numerous fields such as compilations of folklore, copies of Kurdish manuscripts, writing of various works, linguistics, and social science. Another area where Mela Mahmud Bazidi spent effort was translation.

1 Dr. End. Pwd., Zanîngeha Mardin Artukluyê Fakulteya Edebîyatê Beşa Ziman û Edebîyata Kurdî. mustafaozturk47@gmail.com

In the collection of Aleksandre Jaba, in the manuscript with the archive number of Kurd 43, there are 84 Persian stories and translations of these stories into Kurdish and French. Kurdish translations were made by Bazidi and French translations were made by A. Jaba. The mentioned stories, which can be considered within the scope of the classical literature, are the first examples of classical Kurdish literature, according to the data is available. In this study, the category of story in Classical Kurdish literature was addressed, and afterwards, the transcriptional text of the abovementioned manuscript was presented.

Key Words: Mela Mahmud Bazidi, Persian, Kurmanji, Translation, Story.

Destpêk

Mela Mehmûdê Bazîdî (1797-1870) yê zana û xwedî kesayetîyeke piralî, di gelek şaxên Kurdolojîyê de xebatên hêja kirine û piranîya van xebatên xwe jî pişti ku Aleksandre Jaba (1801-1894) dinase derxistine holê. Ji ber vê yekê, lêkolerên ku li ser Mela Mehmûdê Bazîdî dixebitin, nabe ku derheqê Aleksandre Jaba yê dîplomatê Rûs de jî tiştinan nebêjin. Lewra A. Jaba, hema bêje di hemû xebatên Mela Mehmûdê Bazîdî de rê li ber wî vekiriye. Li gel vê yekê, di gelek xebatên bi vî awayî yên A. Jaba de jî yekser û neyekser tevkarîya Bazîdî heye. Îroj çêtir kifş dibe ku bi hevkarîya van her du kesan, ji bo çand, edebîyat, dîrok û hwd a Kurdan berhemên giranbuha û ronîker derketine holê. Yek ji van berheman jî di qada wergernasîya Kurdî de ye.

Di *Koleksîyona Aleksandre Jaba Ya Destnivîsên Kurdî* de du nusxeyên heman berhemê hene. Nusxeyên bi hejmara Kurd 42 û Kurd 43 wergera 84 çîrokên Farsî bo Kurmancî dihewîne, ku di her du nusxeyan de jî ji bo berhemê tu nav nehatîye destnîşankirin. Ji ber ku Kurd 43 li gorî ya dinê têkûztir e, di tîpguhêzîyê de ev nusxe hat esas girtin û her wiha nirxandin û lêkolînên wekî din jî dîsan li gorî vê nusxeyê hatin kirin.

Çîrokên ku di vê berhemê de cî digirin, ji alîyê naverokê ve çîrokên pendgirtinê ne; lewra ne dirêj in, kurt in û tecribe û hîkmeta gel ya hevpar derdibirînin. Her wiha ev çîrokana ji aliyê avanîya xwe ve jî kurteçîrokên klasîk in û wekî çîrokên *Mesnewî* ya Mewlana û *Mentiqu't-Teyr* a Ferîduddîn Ettar li gorî rêçikên edebîyata klasîk hatine nivîsandin.

Li gorî agahî û daneyên berdest, di edebîyata Kurdî de, çi telîf û çi werger, berî vê berhemê tu daneyeke çîrokên klasîk ên pexşan (mensûr) ne hatine hilberandin. Ev berhem ji vî alîyî ve wekî berhema yekemîn tê xuyanê. Her çiqas çîrokên Mela Mûsayê Hekarî yên sedsala hivdehem hebin jî, ev çîrokana li ser qada gelêrî tên hesibandin. "Lê belê em ji arşîva Aleksandr Jaba dizanin ku Mela Mûsayê Hekarî hîn di sedsala XVII. de zêdetirî 50 çîrokên kurdî yên gelêrî

berhev kirine û ew bi navê *Durru'l-Mecalîs* wekî pexşankî nivîsîne (Pertev, 2014: 13)." Dîsan, berhemeke Bazîdî ya din jî heye, ku ew jî di qada gelêrî de ye. "*Camiayê Rîsale û Hikayetê Ekradiyye* li ser edebiyata kurdî ya gelêrî ye. Tê de 3 meqale û 40 çîrokên gelêrî hene (Pertev, 2014: 13)."

Çend Nîşe Derbarê Çîroka Klasîk de

Berhemên edebî bê guman bi dorhêla civakî û dînî ya civatê ve girêdayî ne û ji sedsalan vir ve wekî hefizeya civakî ya gelan hebûna xwe didomînin. Di nava berhemên edebî de gelek cûreyên menzûm û mensûr hene. Ji vana jî cîyê çîrokan gelekî girîng e. Wekî yên din çîrok jî ji giyana gel der çûye, di nava xwe de nirxên gel yên hevpar hewandiye û bi xwedîtîya mîrateyeke çandî ya dewlemend hebûna gel ya neteweyî bi awayekî rast û dirust parastîye. Çîrokên ku Bazîdî ji Farsî wergerandine, her çiqas ji ziman û edebîyata Farsan be jî, mesajê ku dide xwendekaran ji bo çand, jîyan û paradîgmaya hemû netewên rojhilatî derbasdar in.

Derbarê jêderka çîrokên klasîk yên li rojhilat de, gelek zanyar teorî pêşkêş kirine; lê belê di vê derbarê de herî zêde wekî jêderka çîrokan qisseyên Quranê tên pejirandin. Li gorî nêrînên gişti çîrok, weke cureyeke edebîyata klasîk jêderka xwe, di serî de bi bandora Îslamîyetê ji qisseyên Quranê, menqibeyên ewlîya û enbîyayan wergirtîye.

> "Bingeha çîrokên kurt Qurana pîroz e. Di Quranê de qisse, ku em dikarin qisseyan wekî çîrokên kurt jî binav bikin, cîyekî girîng zeft dikin. Li gorî tesbîta lêkoleran ji çara sê parçeyê Quranê ji van qisseyan pêk tê. Dema ku Xwedê Te'ala bi navgînîya Cenabê Pêxember mirovatîyê vexwendî rêya rastîyê kirîye, ji bo ku heqîqet li ber çavên wan şênbertir bibe, di Quranê de van qisseyana nimûne girtîye. Ev kurteçîrokên Quranê, ku bêhtir ji bo îfadekirineke zelal û bandorkirinê hatine bi kar anîn, bi navgînîya taybetmendîyên islûba xwe, bandor li ser hemû mielifên Îslamî û berhemên wan kirîye (Ayan, 1991)."

Wekî cûreyeke vegotinê peydabûna çîrokê li civaka rojava û rojhilatê pêvajoyeke nêzîkî hev parve dikin. "Çawa ku di edebiyata rojava de pêşîyê destanên Yewnanî û pişt re jî qisseyên Tewrat û Încîlê bûne çavkanîya çîrokên rojavayî, bi heman awayî di kelepora çîroka rojhilat de jî çîrokên Hind û Cahilîye û herî dawîn jî qisseyên Qurana pîroz bûne çavkanî (Yazıcı, 1998: 480)."

Ahmet Hamdi Tanpınar, çîrokên klasîk wekî *Çîroka Şerqê* bi nav dike û van çîrokan ji rasteqînîyê dûr dibîne, û her wiha wesfa bingehîn ya vê kevneşopîya çîrokê jî wekî ji her alîyî ve wekî çêkirî rave dike (Tanpınar, 1988: 289). Li gorî wî, çîroka şerqê realîteyê înkar dike û mirov ji fikra rasteqînîyê dûr dixe. Ji ber vê yekê ye ku çîroka şerqê di çarçoveya folklorê de maye (Tanpınar, 2000: 61). Pertev Naili Boratav jî, tunebûna rasyonalîteyê di çîrokên klasîk de kêmanîya

herî mezin qebûl dike û vê xalê wekî cudabûna di navbera çîrokên klasîk û modern rave dike. Li gorî Boratav çîroka modern jî xwe dispêre rasyonalîteyê (Tökel, 2000: 45-46). Li gorî Tanpınar û Boratav çîroka klasîk ji rasyonaliteyê û bi gotineke din jî ji realîteyê bêpar e. Lê wextê ku em li naveroka çîrokên Bazîdî yên wergerandîye dinerin bi tu awayî tiştekî aşopî, derasayî û derî aqil bi ber çavan nakeve. Bûyer, leheng û qewimînên di van çîrokan de, bê awarte, rasteqîn in û tiştekî ku aqil qebûl neke di wan de tune ye.

Hasan Kavruk, çîrokên klasîk ji alîyê çavkanîyê ve senifandîye û wan wek yên wergerî, yên telîf û yên ku ji çîrokên bîyanî hatine adaptekirin di sê beşan de tesnîf kirîye (Kavruk, 2000: 526). Li gorî mijarê jî çîrokan wekî qehremanî, macerayî, dînî-tesewifî, exlaqî û letîfeyî dabeş kirîne (Kavruk, 1998: 14).

Li gorî senifandina Kavruk, çîrokên ku Bazîdî wergerandine, ji alîyê çavkanîya xwe ve bêguman çîrokên wergerî ne. Em dikarin çîrokên Bazîdî ji alîyê mijar û naverokê ve jî hem dinî-tesewifî, hem exlaqî û hem letîfeyî qebûl bikin. Lewre ev 84 çîrokên ku em behsa wan dikin, bigelemperî pêkenokî ne û di armanca şîretkirina dîn û exlaqê de ne.

Di kevneşopîya çîrokên edebîyatên rojhilatî de berî her tiştî mesaja başîyê, rastîyê û xweşikayîyê heye. Digel vê yekê bi zimanekî ne dîdaktîk, lê belê bi vegotineke pîsporane xwendevan di bin tesîra xwe de dihêle. Ev hewla çîrokê giş, bi hilkefta çalakîyeke hunerî, ji bo gihîştina insanê kamîl e. (Tosun, 2017, 43). Ji ber ku çîrokên Bazîdî dinî-exlaqî ne, mebest jî bi xwe lêgerîna insanê kamîl e, ango pêkanîna merivê qenc e.

Çend Agahî Derbarê Destnivîsa Kurd 43'yê de

Destnivîsa Kurd 43 bi tevahî 102 wereq e. Wiha xuya ye ku destnivîs di hundurê zerfekê de hatiye parastin û li ser ruyê zerfê jî bi destxeta A. Jaba bi Fransî du hevok hatine nivîsandin:

84 Contes persans tradues en Kurde par Mella Mahmoud Bazidi.

Traductions française avec les textes perans et Turc en regard par Auguste Jaba[2] (Bnr.: Pêvek 1).

Di hevoka duyem de behsa metneke Tirkî jî hatîye kirin lê tu metneke Tirkî di naveroka vê destnivîsê de tune ye. Her wiha agahîyên nêzîkî vana di pêşiyê de di wereqeya 1a'yê de jî hene. Tenê cudahîyek heye ku A. Jaba li vir unwan, cî û dîroka destnivîsê jî nîşan daye:

... Consul de Rusie en retraite. Smyrne 1868.[3]

2 84 çîrokên Farsî wergerên wan yên Kurdî ji alîyê Mela Mehmûdê Bazidî ve. Wergera Fransî ligel metnên Farsî û Tirkî ji alîyê Auguste Jaba ve.

3 Konsolosê Rûsya yê malnîşîn. Izmîr 1868.

Ji bo vê berhemê li tu cîyê nusxeyê nav an sernav nehatîye destnîşankirin. Gelo Bazîdî van çîrokana ji berhemeke Farsî wergirtîye yan jî ji xwe re ji edebîyata Farsî berhovoka çîrokan dirust kiriye, ev yek ne kifş e. Digel vê yekê, her çiqas navek ji bo berhemê nehatibe destnîşankirin jî, çîrokên berhemê ji 1'ê heta 84'ê hatîye hejmarkirin.

Berhem ji 84 çîrokên Farsî pêk tê. Ev çîrokana berê bi halê orîjînal yanî bi Farsî hatine nivîsandin. Bazîdî wergera van çîrokan a Kurmancî nivîsandîye û piştre A. Jaba jî li kêleka wergera Kurmancî tîpguhêzîya wan a Latînî nivîsandîye. Her wiha A. Jaba wergera Fransî jî li kêleka metnê Farsî nivîsandîye. Li gorî vî halî, her rûpel wekî du sitûnan hatîye bikaranîn. Di rûpelên rastê de (wereqên b'yê) wergera Bazîdî ya Kurmancî û tîpguhêzîya A. Jaba li nik hev cî digirin. Di rûpelên çepê (wereqên a'yê) de jî metnê Farsî û wergera A. Jaba ya Fransî li nik hev in (Bnr.: Pêvek 3, 4).

Ji xeynî agahîyên navborî, derbarê destnivîsê de hin taybetîyên nusxeyê wekî din jî hene. Destnivîs bê berg e, wekî berê jî hate gotin, wereqên destnivîsê di hundurê zerfekê de hatine parastin. Di nusxeyê de kaxezên zer û asayî hatîne bikaranîn. Li jora wereqan bi Erebî, li jêra wereqan bi latînî hejmarên rûpelan hene. Her rûpel bi 13 xêzan hatine xêzkirin. Ebada nusxeyê 23X33 cm. ye. Metna orîjînal û wergera Bazîdî yanî beşên ku bi herfên Erebî hatine istînsexkirin bi xeta ruq'eyê ne. Ji şibihandina wan tê famkirin ku ji bilî wergera Kurmancî metnê Farsî jî bi destxeta Bazîdî ye.

Çend Nîşe Ji Bo Tîpguhêzîya Metnê

Tîpguhêzîya nusxeyê, heta ji dest hat li gorî rê û rêçikên zanistî hat kirin. Lewma, heger mistensix (Bazîdî) şaş nivîsandibe jî me dest lê ne da, çi be me ew esas girt. Lewre tu mafê me tune ye ku em şaşîyên mistensix rast bikin.

Karê tîpguhêzîyê tenê ji bo beşa Kurmancî hat kirin û herfên transkrîpsîyonê yên taybet ne hatin sepandin. Tenê herfa eyn (ع) û hemzeyê (ء) bi îşareta dabirrê (') hat nîşandayin.

Derbarê kelîmeyên ku di xwendin û teşxîsa wan de dijwarî hebûn, me ji tîpguhêzîya A. Jaba jî sûd wergirt. Lê belê ji ber ku, bi ihtîmaleke mezin, A. Jaba çawa bihîstibe wiha nivîsandîye û bivê nevê di Kurmancî de zêde ne pîspor e, şaşî di nivîsandina wî de hebûn. Di cîyên wiha de me berê xwe da metnê Farsî.

Wekî hemû destnivîsên klasîk, di vê metnê de jî rêzikên xalbendîyê û rastnivîsê nehatibûn tetbîqkirin. Rêzikên xalbendîyê ji bo hêsanbûnê me bi teserûfa xwe bi kar anîn. Xal, bêhnok, baneşan, dunik û hwd çi hebin, di metnê resen de tune ne, bi teserûfa me lê hatin zêdekirin. Sînorên wereqan bi kevanekên koşedar hatin îfadekirin: [1b], [38b], [92b] ... Ji bilî vana, wateyên bêjê û têgînên di metnê de yên ku zêde nenas jî bi jêrenotan hatin destnîşankirin.

METN:

[1b] **HIKAYETA ÎBTÎDA**

Du jin derheqê zarokekî de'wa dikirin û şahid jî tune bû. Her dû çûne nik qazî. Û hikm ji qazî xwastin. Qazî cellad gazî kir. Emir kir ku vî zarokî du parçe bike û bide her du jinan. Jinek ku ev xebera bihîst bêdeng ma. Û jina dinê dest bi gazî û zarîyê kir ku, "Di rêya Xudê! zaroyê min du parçe meke. Eger 'edl wuha ye ez zaroyî naxwazim." Qazî tehqîq kir ku dîya zaroyî ev e. Zaroyî ra bi wê sipart û jina dinê ra qamçî lê da û qewirand.

HIKAYETA DUYAN

Merifek çû nik xwendekar[4] û îfade kir ku, [2b] "Merifekî dayîma tête mala min û digel jina min dostî heye; lakin weqtê wî nizanim û wî nabînim ku kî ne. Ewî dixwazim bigirim. Ji hezreta we hêvîya intîqam û 'edlê didêrim." Xwendekar şîşeyekê 'itrê da wî û emir kir ku, "Vê bispêre jina xo û bêjî ku, bi kesekî nede." Û mêrik wusan kir. Xwendekar çend casûs tayin kir, ku li mala wî rûnên û ji cilê herkesî ku behna 'itrê bi ewê bigirin û bînin. Hasilî, mêrik firset dît û balî jinikê ve çû, 'itr di cilêd wê malê ve jinik got ku, "Eger çî mêrê min emir kir ku vê 'itrê mede kesekî. Lakin tu ku can di ruhê min î. Eger eva bi kêrî tê neyî êdî [3b] ji boy çi bikêr têtin." Mêrik ji wê derê biderket. Casûsan ji bêhna 'itrê, serê rê girtin û êsîrkirî birine pêş xwendekar. Xwendekar jî ew merif xwast û got, "Yarê jina te hazir e. Ewî bibe bikuje yan bibexşîne."

HIKAYETA SÊYAN

Jinek çû nik qazî û got ku, "Filan merif cebrî digel min zina kir." Qazî jî ew merif teleb kir û pirsîyar kir ku, "Ji bo çi te avrûya vê jinê dît?" Mêrik înkar kir. Qazî emir kir ku deh rub'îye cirm bide vê jinê. Mêrik naçarî, bêsebeb hikmê qazî, zêr da jinikê. Wekî jin biderve çû, qazî emrî mêrikî kir ku, [4b] "Here, dirafê xo ji jinikê bişûve[5] bîstîn." Mêrik ku ev hikma dît, bezî û çiqasî ku xwast cebrî rub'îyan[6] ji jinikê bişûve bistîne nikarî. Jin bişûve hate nik qazî û îfade kir ku, "Ew merif cebrî rûb'îyan ji min distîne. Heta niha min ne dayê. Eger riza we heye bidim." Qazî got, "Merikê ku bi zorê diraf ji we istandin nikarî, bê riza we çawan karî ku digel we zina bike. Tu derewîn î. Here û dirafî bidê û paşî wuha buhtan û îftîran meke."

HIKAYETA ÇARAN

Di bajarekî 'enbarekî penbo hate dizîn. [5b] Penbofiroşan şikayet birin nik xwendekar. Xwendekar her çiqas pirsîyar emir kir, dizî nedît. Mêrek îfade kir, "Eger emir bide ez dizan bigrim." Xwendekar jî hikim da. Mêr çû mala xo û

4 Ev kelîme ji dêleva "siltan", "hikimdar" û "padîşeh" tê bikar anîn.
5 Şûnve. Şûnde.
6 Cureyeke diravê ye ku wateya wê "çaryek, çarîk" e.

mezin û biçûkê bajêr bi behana mêvanîyê hemû gazî kir. Weqtê ku merif hemû li wê derê berhev bûn û rûniştin, mêr çû wê meclisê û bi rûyê hemû merifan nihêrî û got. "Çi heramzade û bê heya û ehmeq merif in ku penbo dizîne û hûrêd penboyan di nêv rihê wan cîh kirine û hettanî meclisa min." Çend merifekan wî weqtî rihêd xo [6b] bi deste xo pak kirin û me'lûm bû ku ew diz in. Xwendekar li wê hikimê mêrî aferin û tehsîn nîşan da.

HIKAYETA PÊNCÊ

Mirofek çû nik xwendekar û got ku, "Şeva dinê merifek ji leşkerê xwendekar cebrî hate mala min û digel carîya min zina kir". Xwendekar emir kir, "Eger ev merif tekrar bête mala we heman wê demê xeberê ji bo min bîne." Şeva duyê ew merif tekrar hat. Xoyê malê xwendekar xeber da. Xwendekar jî şîr di dest da girtî, [7b] digel wî rewan bû. Weqtê ku gîhişt mala wî berê çira vemirand, paşê wî ew merif kuşt. Û paşê çira xwast û rûyê wî merifî dî û şikrê Xudê kir û gote xoyê malê, "Her zadê ku di mala we mewcûd e bîne." Xoyê malê zad anî. Xwendekar jî zehf bi dilxoşî ew zad xor. Xoyê malê pirsîyar kir ku, "Ey xwendekar, bi sebebê çi berê te çira vekuşt û paşê ew merif kuşt. Rûyê wî merifî we dît, şikrê Xudê kir û zad jî bêweqt we xor?" Xwendekar emir kir ku, "Min zen bir ku, bixeyr ji kurrê min ji kesekî ra qudret [8b] nîne. Ji bo wê sebebê ji îbtîda min çira vemirand ku, eger rûyê kurrê xo bibînim ji rehmê ewî nikarim bikujim. Wekî hate kuştin min çira teleb kir û rûyê wî dît û şikrê Xudê kir ku kurrê min nîne. Wê weqtê ku te ji min 'edl xwast, min digel xo got ku, *hetawî merifî nekujim, qet tiştekê naxum*. Ji wî weqtî esla[7] min nexoribû. Ji bo wê qewî birsî bûm û min zadê bêweqt xor."

HIKAYETA ŞEŞÊ

Melayekî hezar rub'îye bi 'ettarekî siparî û çû seferê. Paşî middeyekê [9b] ji seferê bişûve hat û rûb'îye ji 'ettarî xwast. 'Ettar got, "Derew dibêjî, te ne siparî min." Mela digel wî 'alliqî û merif jî berhev bûn û mela derewîn deranîn û gotin, "Ev 'ettara zehf dîndar e, ti weqtê xiyanet ne kirîye. Eger digel wî mubahese bikî, ceza xo dixwazî bibînî." Mela 'aciz bû, naçar ehwalê xo li ser kaxezekê nivîsî û nîşanî xwendekar da. Xwendekar emir kir "Here li nik dikana 'ettarî sê rojan rûnê, qet tiştekê mebêje. Roja çaran bi wê terefê dixwazim bêm û selam li te dikim. Bixeyr cewaba selamê qet digel min mebêje. [10b] Wekî ji wê derê diçim, dirafê xwe ji 'ettarî bixwaze. Her çi ku ew dibêje min xeberdar bike." Mela jî miwafiqî emrê xwendekar, li ber dikana 'ettarî rûnişt. Roja çarê xwendekar digel heşemetekî zahf bi wê kenarê çû. Wekî mela dît hespê xwe vegirt silav li melayî kir. Mela cewaba silava xwendekar got. Xwendekar emir kir, "Êy bira, carinan bi nik min nayî û qet halê xwe nabêjî min". Mela hindek serê xwe hejand. Bixeyr ji wê qet negot. 'Ettar ev hemû dîtin û ditirsîya. Wekî xwendekar

7 Qet. Zînhar. Teqez.

çû ‘ettar gote melayî, “Wekî te diraf ispartîye min ez li ku bûm û kîjan merif jî wê hingê li nik min hazir bû?” Eva ji wî pirsîyar kir: [11b] “Bişûve bibêje, dibe ku min bîr kirîye.” Mela jî hemû ehwal bişûve got. ‘Ettar got, “Rast dibêjî, niha hate bîra min” Xulase, hezar rub’îyê melayî da û ‘ozr xwast.

HIKAYETA HEFTÊ

Du merifan mala xo sipartine pîrejinekê û digotin ku, “Her çi weqtê ku em her du dixwaze bêm malê xo digirim.” Paşî çend rojekan mirofek ji wan hate nik jinikê û got, “Hevalê min jî mir, niha malê min bide”. Pîrejin naçar bû û ew mal da. Paşî çend rojekan merifê dinê hat û mal xwast. Jinikê got “Hevalê te bir [12b] û ji te ra mirîye got.” Û beyan kir, “Her çiqas min se’y kir, lakin xeberê min ne bihîst û mal hemû jî bir.” Merifê me’lûm jinik bir nik qazî û ji qazî hikim xwast. Paşê milaxazayê[8] gîha ku jinik bê teqsîr e. Emir kir ku, “Ji îbtîda da te şert kiribû ku, çi weqtê ku em her du heval hatin dê hingê malêd xo digirin. Tu here hevalê xo bibîne û malî bistîne. Bitenê çawan dikarî bistînî?” Mêrîk bê cewab bû û rêya xo girt.

HIKAYETA HEŞTÊ

Xulamek ji nik axayê xo revî. Paşî çend rojekan axayê wî çû bajêrekî dinê. [13b] Xulam li wê dere dî û ji wî ra got û girt “Ji bo çi revî?” Xulam destê xo li damena axayî da û got, “Tu xulamê min î û dirafekî zahf te ji min dizîye û revî û niha min tu dîtî. Dixwazim ku li te ceza bikim.” Xulase, her du bi hev ra çûn nik qazî û hikim xwastin. Qazî jî ew herdukan li nik şibakê da sekinandin û emir kir ku, “Hûn her dû bi carekê serêd xo ji şibakê bi derve bikin.” Wekî herdûkan serê xo biderve deranîn, emrî celladî kir ku bi şîr li serê xulamî bide. Xulam weku ev xebera bihîst, fîlhal serê xo bi hinduro kêşa û axayê wî qet esla ne lepitî. Qazî li xulamî ceza kir û siparte xoyî.

[14b] **HIKAYETA NEHÊ**

Merifekî malekî zehf siparte serrafekî û çû seferê. Wekî bişûve hat xwastin kir. Serraf jî înkar kir. Û sond xwar ku, te ne sipartîye min. Ew merif çû nik qazî û ehwalê xo got. Qazî, mela hez kir û emir kir bi kesekî bibêje ku, filan serraf malê te nade. Tedbîrekê ji malê te ra dixwazim bikim.

Roja dinê qazî serraf gazî kir û got, “Zehf şixulîn hatîye pêş min. Bitenê hikim kirinê nikarim. Dixwazim ku te ji bo xo nayîb bikim. Lewra ku tu merifekî sahib dîn î.” Serraf jî qebûl kir û zehf xoşhal bû. Wekî hat mala xo [15b] qazî ew merif teleb kir û gotê ku, “Niha here malî xo. Ji serrafî bixwaze elbete malê te dide” Ew mêrik çû nik serrafî wekî serrafî rûyê wî dîtî, “Were were, xoş hatî. Min malê te ji bîr kiribû. Şevê dinê hate bîra min.” Xulasa malê wî da û ji tema’a

8 Bi baldarî fikirîn. Kifşkirina bi hûrgilî derbarê meseleyekê de.

nayîbîyê çû nik qazî. Qazî got, "Îro çûbûm nik xwendekar min bihîst ku şuxlekî mezin dixwaze bête sipartin. Min ji Xudê ra şikir kir ku rutbeyekî mezin dixwazî bigrî. Niha lazim ku nayîbê dinê ji bo xo tedarik bikim." Xulase, qazî ew merif bi vê hîleyê izin da.

[16b] **HIKAYETA DEHÊ**

Jinekê digel jinekê cîranê dijminî didêra. Şevekê mey zehf vexwar û serxoş bû. Û zaroyê xo kuşt û havête mala jinika cîranê. Û sibeyê li jinikê iftîra kir ku, "Zaroyê min kuştîye." Ew jinik bire pêş qazî. Qazî berê jinika cîranê bire xelwetê[9] û zehf tirsand. Û got, "Rast bibêje. Û ger ne, dixwazim te bikujim." Jinik sond xwar û înkar kir. Qazî got, "Eger li ber min rûbirû tazî dibî ez te rastgo zen dikim." Jinik ji şerman serê xo derbejêr kir û got, "Min bikuje qebûl e, lakin wuha tazîbûyinê ji min hêvî meke, [17b] nakim." Qazî izna wê jinikê da. Jinika ku hewar, gazî dikir anî xelwetê û got, "Eger li nik min tazî dibî ez xebera te bawer dikim." Ew ji nik xwast ku xo tazî bike. Qazî men' kir û got "Te bi xo kurrê xo kuştîye." Wekî çend qamçî lê da. Qamçî xwar îqrar kir ku, "Min bi xwe qisûr û iftîra bi serê wê danî." Xulase, qazî ew kêşa darê.

HIKAYETA YAZDEHÊ

Merifek du hezar rub'îye di nêv kîsekî serbemuhr isparte qazî û bi xo çû seferê. Wekî[10] bişûve hat kîsikê xo wuha serbemuhr ji qazî [18b] istand û vekir, pûlek dît. Digel qazî de'wa girt. Qazî got "Here, derew mebêje. Te rub'îye jî nîşanî min ne daye û ne ispartîye min. Kîsekê serî mohrkirî ku ispartîye min wusan dîsan bişûve istandî." Merifêd qazî ew qewirandin û merif çû nik xwendekar û halê xo îfade kir. Xwendekar hindekî milaxeze kir. Emir kir, "Niha here û kîsikê li nik min bihêl. 'Edla te dixwazim bidim." Roja dinê xwendekar, mîndera ku nû li ser textê bû hindek ker[11] kir û çû nêçîrê. Xizmetçê ku wê rojê dora wî bû, wekî mînder hilanî, dît ku mînder ker bûye tirsîya û lerizî. Û xulamê dinê ku wuha dît gote wî ku, çi bûye ku wuha ye bi wî got: [19b] "Eger xwendekar vê bibîne dixwaze min bikuje" Got, "Kesekî ev xebera bihîstîye, ya mînder dîtîye?". Got "Na." Wi got, "Metirse, di vî bajêrî vehonkerek[12] heye qewî qabîl. Mînderê bibe nik wî. Wusan dikare vehone ku kesek qet ferq nake." Xulam çû dikana wî û mînder da wî û got, "Her çi dixwazî didim te, lakin biqencî vehone." Vehonker nîv zêr xwast. Xulam zêrekî temam bi wî bexşî. Vehonker di şevekê ve hona û da xulam. Roja dinê mînder dîsan li ser textê raxist. Xwendekar wekî minder sax dît, ji xulamî pirsîyar kir ku, "Ev mîndera kê honaye?" Xulam berê înkar kir. Xwendekar emir kir ku, "Qet metirse, ji bo meslehetekê min ev perçe kiribû." Xulam

9 Bi tenêyî. Bi awayekî veşartî.
10 Di wateya "çawa ku" de tê bi kar anîn.
11 Parçe. Pirt. Qet. Par.
12 Honanker. Tevnker.

jî salix da ku [20b] xwendekar ew vehonker xwast û got ku, “Wekî vê kîsikê ne honaye?” Got, “Belê”. Got, “Wekî kîsikê bibînî nas dikî?” Got, “Erê.” Xwendekar kîsik nîşan da. Vehonker kîsik nas kir û got, “Qazîyê vî bajarî ji bo vehonanê dabû min.” Xwendekar qazî teleb kir û got, “Li ser dîndarîya te min bawerîyekî temam didêra. Li ser vê xeberê mansiba[13] qazîtîyê min dabû. Min nizanî ku tu diz î. Malêd merifan ji bo çi didizî!” Qazî got, “Ey xwendekar, kî dibêje?” Got, “Ez dibêjim.” Paşê kîsik nîşan da û cihê honanê nîşan da. Qazî şerm kir. Xwendekar qazî şande zindanê û emrî xoyê kîsikê kir ku dirafê xo ji qazî bistîne. Qazî naçarî dirafê wî da. Roja dinê [21b] xwendekar, qazî kêşa darê.

HIKAYETA DİWAZDEHÊ

Merifekî, kîsikê dirafê wî di mal da wenda bû. Ew jî xeber bi qazî da. Merifêd malê teleb kir û bi her kesekî zillek[14] da ku evê wuha bikin ku hemû di dirêjayî da wekî hev bin û got, “Her kî diz e, zilla wî biqasî tilûyekê dirêj dibe.” Wekî izna çêkirinê bû, merifê ku diz bû tirsîya û biqasî tilûyekê ji zilla xo tiraşî. Roja dinê ku qazî hemû teleb kirin û zill hemû dîtin. Me’lûm kir ku diz kî ne. Dirafî ji wî istand û te’dîb kir.

[22b] **HIKAYETA SÊZDEHÊ**

Merifekî digel yekî şert kir ku, “Eger ez leyizê nebim kerekî[15] goşt ji wicûda min bitiraş.” Wekî leyizî nebir. Midde’î jî bicîanîna şertê xo xwast. Ewî qebûl nekir. Her du çûn nik qazî. Qazî gote de’waçî, “‘Efû bike.” Qebûl nekir. Qazî ‘errinî. Qazî emir kir ku, “Bitiraş, lakin eger hindikî zêde ji şertê eger bitiraşî dixwazim ku sîyaset li te bikim.” De’wacî ji vê xeberê ne karî, naçar ‘efû kir û bexşî û borî.

[23b] **HIKAYETA ÇARDEHÊ**

Du birayê mendebûr çûne seferê û di rê da kîsikî tijî zêr û parçe cewahir dîtin. Birayê biçûk jî got, “Merama min hasil bû. Niha dixwazim ku herim mal.” Birayê mezin got, “Dixwazim dinyayê temaşa bikim.” Û zêr parê kirin. Birayê mezin payê xo bi birayê biçûk, sipart û got, “Bide jina min.” Wekî ew gîha mal, para birayê xo da jina wî. Meger ku cewahir jî ne da. [24b] Paşî sê salan birayê mezin jî ji seferê hate mala xo. Cewahir li nik jina xo ne dî. Ji birayê xo pirsîyar kir ku, “Cewahir çawan bû?” Got, “Min da jina te.” Got, “Ew dibêje ku min ne dî.” Got, “Derew dibêje.” Ew merif dest bi tekdîr û texdîra jina xo kir. Jin jî revî û çû nik qazî û halê xo bişûve got. Qazî jî mêrê wê digel birayê wî teleb kir. Û ji birayê wî pirsîyar kir ku, “Wekî te cewahir bi vê jinikê sipart, kesek wê weqtê hazir hebû ya ne?” [25b] Got, “Du kes.” Qazî emir kir ku, “Here bîne.” Ew jî hindek diraf da wan û got, “Digel min werin û li nik qazî bicîhî derew şahidîyê

13 Meqamê bilind. Paye.
14 Darikê pirr zirav.
15 Parçe. Beş. Par. Pirt.

bidin." Hasilî, ew du merif şahidî dan. Qazî jî emrî mêrê jinikê kir ku, "Here, cewahirê ji jina xo bistîne." Jinik bi girî ji nik qazî çû bi nik xwendekar û ehwalê xo jê 'erz kir. Xwendekar emir kir ku, "Ji bo çi naçî nik qazî?" Got, "Çûbûm, lakin bi qencî hikim nekir." Xwendekar jî ew her du bira jî digel her du şahidan jî [26b] xwast. Û her yek ji hev cuda kir. Û şima[16] da ku li sûretê wê cewahirê jî çêkin. Ew herdû bira misawî[17] çêkirin. Ew her du şahid jî bi sûretê mixtelîf. Xwendekar emrî jinikê kir ku, "Tu jî çêke." Înadê kir ku, "Min cewahir ne dî, çawan çekim?" Xwendekar jî sîyaset li şahidan kir. Emir kir ku, "Eger rast bibêjin dixwazim ji we biborim. Û eger ne, dixwazim bikujim." Naçarî îfade kirin, "Bi derew me şahidî daye." Xwendekar çend qemçî li birayê biçûk da. Îqrar kir ku, "Min qisûr kirîye." [27b] Xwendekar li qazî jî 'îtab emir kir ku, "Ji bo çi te bi qencî hikim nekir." Û cewahir jî da jinikê.

HIKAYETA PANZDEHÊ

Ciwanekî sed zêr isparte pîremêrekî û çû seferê. Bişûve hat zêrrêd xo xwast. Pîremêrî înkar kir, "Te ne daye min." Ciwan bire nik qazî pirsîyar kir. Qazî jî pîremêr xwast û pirsîyar kir ku, "Eve ciwana zêr sipartîye te." Got, "Na". Qazî emrî ciwanî kir, "Kesek [28b] şahid didêrî?" Got, "Na." Qazî gote pîremêrî ku, "Sond buxu". Ciwan girî û got, "Qet wefa wî ji sondê nîne. Zehf caran bicîhê derew sond xorîye." Qazî gote ciwanî, "Weqtê te zêr isparte wî, li ku rûniştî bûyî?" Got, "Li binê darê." Got, "Ji bo çi dibêjî şahid nîne? Ew dar şahidê te ye. Here nik wê darê û bibêje ku, qazî te dixwaze." Pîremêr kenî. Ciwan got, "Ey qazî ditirsim ku dar bihikmê we neyê." [29b] Qazî got, "Mohra min bibe û bibêje ku eva mohra qazî ye. Elbete dixwaze bêtin." Ciwan mohra qazî girt û çû. Qazî paşî sa'etekê ji pîremêrî pirsîyar kir, "Ew ciwan gîha nik darê?" Got, "Na." Wekî ciwan çû nik darê mohra qazî nîşan da û got, "Qazî te dixwaze." Ji darê qet ne bihîst. Bi xem bişûve hat û got, "Mohra we min nîşanî darê da, qet cewab ne da." Qazî got, "Belê, dar hat û şahidî da, bişûve çû." Pîremêr got, "Ey [30b] qazî, ev çi xeber e, qet dar ne hate vira." Qazî got, "Rast dibêjî. Ne hat, lakin wî weqtê ku min ji te pirsîyar kir ku ciwan gîha darê, te cewab da ku, ne gîha. Eger te li bin wê darê diraf ne istandîye ji bo çi te ne got ku, kîjan dar e, ez nizanim. Ji vê me'lûm e ku ciwan rast dibêje." Pîremêr îlzam bû 'û diraf da ciwanî.

HIKAYETA ŞANZDEHÊ

Masîgirek dayîma masîyêd behrê [31b] digirt û di sûqê da difirot. Rojekê masîyekî saq[18] girt. Wusan deha[19] masîyekî rind weqtekî ne girtibû. Bi dilê xo

16 Mûm. Şemal.
17 Wekhev. Yeksan.
18 Laq. Qelew û bigoşt.
19 Hêj. "Daha" ya Tirkî.

got ku, “Eger ez vî masîyî di sûqê da bifiroşim zêde ji du û sê pûlan bidest nayê. Qencî ew e ku bibim nik xwendekar. Qata[20] dixoze ku zehf îhsan digel min bike.” Hasilî, masî bire nik xwendekar. Xwendekar wekî masî dî, zehf begen kir[21] û xoşnûd bû. Û emir kir ku, “Sed rub’îye bidin masîgirî.” Wezîr wê weqtê [32b] hazir bû. Di guhê xwendekar îfade kir ku, “Ji bo masîyekî ev qeder diraf dayin minasib nîne.” Xwendekar jî cewab da ku, “Eger nedim cîhê şermê ye. Lewra ku min emir kir, çawan dibe?” Wezîr got, “Minasib ew e ku ji masîgirî bipirsin ku, ev masîya nêr e weyanî mê ye. Eger bibêje, nêr e, ê mê ji wî bixwazin. Eger bibêje mê ye, ê nêr ji wî bixwazin. Masîgir hevala wê anîn, nikare bîne. Paşê îhsan jî naxwaze bibîne.” [33b] Xwendekar xebera wezîrî pesinî û ji masîgirî pirsîyar kir ku, “Eve masîya nêr e ya ne mê ye?” Masîgir cewab da ku, “Ev masîya xunsa[22] ye.” Xwendekar jî zehf kenî û ew sed rub’îye bi wî bexş kir.

HIKAYETA HIVDEYÊ

Sûdager[23] çûne nik xwendekar û çend hesp nîşan dan. Xwendekar zehf begen kir û kirî. Du sed hezar rub’îye zêde ji buhayê da sûdageran. Û emir kir ku, “Bişûve ji cîhêd xo hespan bînin.” Sûdageran jî [34b] destûr bû rojekê. Xwendekar di halê mestî û serxoşî gote wezîrî ku, “Navêd hemû eblehan binivîs.” Wezîr îfade kir ku, “Berî niha min nivîsîye û di berê hemû navan navê hezreta we ye.” Pirsîyar kir û got, “Ji bo çi te du sed hezar rub’îye da sûdageran, ji anîna hespan bê kefil û bê zanîna cîhêd wan? Eve ‘elametêd ehmeqîyê ye.” Xwendekar got, “Eger sûdageran hesp anîn paşê çawan dikî?” Got, “Eger bînin, navê hezreta we ji deftera eblehan hek[24] dikim. Û navêd sûdageran li wê derê dixwazim binivîsim.”

[35b] HIKAYETA HIJDEHÊ

Rojekê şa’irekî qisûrekî kir. Xwendekar emrî celladî kir ku pêş ewî bikuje. Lerizîn bi endamê wî şa’irî ket. Yaranek gote wî, “Ev çi namerdî ye û bê dilî ye, ku qet ciwanê mêr wuha natirsin.” Şa’ir got, “Ey nedîm, eger tu mêr î were li cîhê min rûnê. Hetaez ji vir rabim.” Xwendekar ev letîfeya pesinî û kenî û ji qisûra wî borî.

HIKAYETA NOZDEHÊ

Jinek diçû, mêrik ew dît û di pêy wê [36b] rewan bû. Jinik pirsîyar kir ku, “Ji bo çi di pêy min têyî?”. Got, “Li te ‘aşiq bûm.” Jinik got, “Li min çi ‘aşiq bûyî? Xweya min ji min rindtir e, ji pêyî min nêt. Here li wê ‘aşiq bibe.” Ji wê derê zîvirî û jinekî kirêd eşkal dît. Zehf ne xoş bû. Di paşê bişûve hate nik wê û got,

20 Ji qat’a ya Erebî tê û bi wateya “Teqez û qet” tê bi kar anîn.
21 Ji “Beğenmek” a Tirkî, anku “Ecibandin”, “Pejirandin”.
22 Nêrûmê. Nêremê.
23 Bazirgan. Ticcar.
24 Jêbirin. Malaştin.

"Çera te derew got?" Jinik got, "Te jî rast ne got. Eger tu 'aşiqî min bûyayî, nik yekî dinê ji bo çi diçûyî?" Şermî bû.

HIKAYETA BÎSTÊ

Ji bo kuzekî[25] gotin, "Dixwazî pişta we rast bibe? [37b] Weyanî pişta merifê dînê jî hemû wekî pişta we kûz bibe?" Got, "Dixwazim ku pişta merifê dinê hemû kûz bibin. Wekî bi wî çavê ku ewan ez didîtim, ez jî ewan bibinim."

HIKAYETA BİST Û YEKÊ

Merifek her rojê şeş nan dikirî. Rojekî dostekî ji wî pirsîyar kir ku, "Şeş nanan her rojî çi dikî?" Got, "Nanekî vedişêrim û nanekî davêjim û du nanan bişûve dihêlim û du nanan jî bi deyn didim." Wî dostî got, [38b] "Xebera te qet fehm nakim. Safî bibêje." Got, "Nanê ku didêrim dixom û nanê ku davêjim bi xwestegan didim û du nanê ku bişûve dihêlim bi bab û dayê xo didim û du nanan jî bi kurrêd xo didim."

HIKAYETA BİST Û DUYÊ

Emîr Teymûr wekî çû Hindîstanê û gîha, mitrib teleb kirin û got, "Min ji mezinan bihîstîye ku, di vî bajêrî mitribêd qenc hene." Mitribekî nabeyna xwendekar hazir bû û dest bi istiranê kir. Xwendekar zehf xoşhal bû û navê [39b] wê pirsîyar kir. Got, "Navê min Dewlet e" Xwendekar got, "Dewlet jî kor dibe?" Ewî cewab go, "Eger dewlet kor nebûya leng nedihatî mal." Xwendekar ev cewaba pesinî û zehf îhsan li wî kir.

HIKAYETA BİST Û SÊ

Merifek çû nik hekîmî û got "Zikê min dêşe, derman bike." Hekîm pirsîyar kir, "Îro te çi xorîye?" Got, "Nanê şewitî" Hekîm xwast ku derman di çavê bike. Ewî merifî got, "Ey [40b] hekîm, êşa zikê digel çavan çi nîsbet heye?" Hekîm got, "Berê lazim e dermanê çavan li te kirin. Eger çavê te (dirist)[26] bûya te nanê şewitî ne dixor."

HIKAYETA BİST Û ÇARÊ

Rojekê xwendekar ji şa'irekî êşa. Emrê celladî kir ku, "Li pêşî min bikuj." Cellad çû ji bo şîr anînê. Şa'ir gote haziran, "Çend sîlleyekan li min bidin, hetaşîr tête anîn ku xwendekar xoşhal bibe." Xwendekar kenî û qisûra wî bexşî.

[41b] HIKAYETA BİST Û PÊNCÊ

Şa'irekî, maldarek pesinî. Qet tiştek nedî. Paşê hicw û zemm[27] kir. Maldar qet tiştek negot. Roja dinê şa'ir çû ber derîyê wî rûnişt. Maldar got, "Ey şa'ir, te medh kir, min qet tiştek neda te û hicw kirî. Min qet tiştek negote te. Niha çima li vê derê rûniştî?" Got, "Niha çi dixozî?" Got ku, "Eger bimirî şîna te bibêjim."

25 Xûz. Qenbûr.
26 Ev kelîme bi şaşî nehatîye nivîsandin, lê di metnê Farsî de heye.
27 Gotina eyb û qisûrên yekî. Rexnekirin.

HIKAYETA BİST Û ŞEŞÊ

Xwendekarek di xewa xo da dît ku, hemû diranêd wî ketine. Ji mi'abbirekî[28] te'bîra wê [42b] pirsîyar kir. Got ku, "Ewlad û xizmêd xwendekar, rûbirûyê xwendekar dixwazin bimirin." Xwendekar 'errinî û mi'ebbir hebs kir. Û mi'ebbirê dinê xwast û te'bîra wê xewnê pirsîyar kir. Îfade kir ku, "Ji hemû ewlad û xizman xwendekar dê zêde bijî." Xwendekar ev nikte pesinî û zehf îhsan da.

HIKAYETA BİST Û HEFTÊ

Merifek rutbeyekî mezin peyda kir. Ji boy mubarekî dostek çû nik wî. Ji wî merifî pirsîyar kir ku, "Tu kî yî û tu ji bo çi hatî?" [43b] Ew dost şermkirî vegerîya û got, "Tu min nas nakî, dostê te yî kevin im. Ji bo serxoşî hatim nik te. Min bihîst ku kor bûyî."

HIKAYETA BİST Û HEŞTÊ

Xwendekarek di şêrê da şikest, revî. Merifek ji tayîfa dijminan ew girt û nas ne kir ku ew xwendekar e. Tedarîka xo da wî û ew gîhande cîhê wî. Paşê qederek birinc da wî ku bipêje. Û bi xo xwendekar zehf birsî bû. Birinc kire kolozê[29] û danî sere agirî. Û bi xo jî serê agirî rûnişt. Seyek hat [44b] û koloz girt û revî. Xwendekar kenî. Ew merif bi xwendekar 'errinî û got, "Ey ebleh, seyê kolozê te bir, tu dikennî. Bibêje sebeb çi ye." Xwendekar bê deng bû. Wekî qemçî dît got, "Rojekî wusan bû ku her çi weqtê biçûma nêçîrê sed dewe tedarîka min aşxana min digel min dibir. Îroje wusan heme ku mistek birinc jî seh nehêla." Ew merif 'ozra xo xwast û borî.

HIKAYETA BİST Û NEHÊ

Rojekê teyrek li ser darekê rûniştî bû. [45b] Xwendekar ewê dî û gote haziran ku, "Evê bi tîr dixawazim bikujim." Tîr û kevan girt û avêtê. Tîrê xelet kir. Teyr firî. Xwendekar zehf şermî bû. Merifek boyî def'a şerma wî got, "Bigerim ku xwendekar li ser kuştina wê qadir bû, lakin ne xwast ku bikuje. Rehm li canê wê kir. Bi xo xelitand."

HIKAYETA SÎYÊ

Merifek tûtîyek[30] xoyî kir. Û zimanê Farsî boyê te'lîm û hûrî kir. Tûtî di cewaba her xeberê digot, "Di vê çi şibhe!" Rojekê [46b] ewî merifî tûtî ji boyî firoştinê bire sûqê û sed rub'îye jî buhayê wê birrî. Moxolek ji tûtîyê pirsîyar kir ku, "Tu layiqî sed rub'îyê heyî?" Got "Di vê da çi şibhe!" Moxol xoşnûd bû û tûtî kirrî û anî mala xo. Her xeber ku digel tûtî dida, digot ku, "Çi şibhe!" Moxol di dile xo da şermî û peşîman dibû. Û got, "Min ehmeqî kir. Wuha tûtîyek kirrî." Dîsan tûtî got, "Çi şibhe!" Moxol kennî û tûtî jî azad kir.

---

28 Kesê ku te'bîra xewnan dike.
29 Kûzik. Cer.
30 Papaxan.

[47b] HIKAYETA SÎ Û YEKÊ

Rojekê xwendekar digel şehzadeyî çûne nêçîrê. Wekî hewa germ bû. Xwendekar û şehzade cilêd xo danîne ser milê qeşmerî. Xwendekar kenî û got, "Ey qeşmer, li ber te barê kerekî heye." Qeşmerî got, "Belkî barê du keran e."

HIKAYETA SÎ Û DUYÊ

Qeşmerekî digel jina xo nêzûkayî kir. Paşî çar mehan jina wî kurrek za. Gote mêrê xo, "Navê vî kurrî dixozî çi daynî?" Got, "Peyk[31], lewra ku rêya neh mehan di çar mehan da birrî."

[48b] HIKAYETA SÎ Û SÊYÊ

Melayek di mizgevtê da digel merifan we'z digot. Merifek di wê meclisê her rojê digirîya. Rojekê mela got ku, "Xeberêd min di dilê wî merifî zehf eser dike. Ji boy vê sebebê digirî." Merifê dinê gotine wî merifî ku, "Xeberê mela di dilê me qet eser nake. Dilê te çawan e ku tu digirî?" Got ku, "Li ber xeberê mela nagirîm. Belkî min tekeyek xoyî kiribû. Û zehf min diva. Wekî teke pîr bû û mir. Her çi weqtê ku mela xeber dide [49b] û rihê wî dilepite teka min tête bîra min. Lewra ku ew jî rîha wuha dirêj didêra."

HIKAYETA SÎ Û ÇARÊ

Merifekî şaşa[32] feqîrekî istand û revî. Feqîr çû qebrîstanê û rûnişt. Merifan gotine wî ku, "Ew merif şaşa we bi kenarê rezan bir. Tu di qebrîstanê ji bo çi rûniştî û çi dikî?". Got ku, "Ew jî axirê dixoze bête vira, lewra li vê derê rûniştime."

HIKAYETA SÎ Û PÊNCÊ

Xwendekarek digel wezîrê xo xurme dixor û dendikê [50b] xurmayê diavête nik wezîrî. Paşî xorinê gote wezîrî, "Tu zehf xora yî. Lewra ku zehf dendikê xurman li pêşî we ketine." Wezîr got, "Na, xwendekar zehf xorayî. Ne dendik hiştine û ne xurma."

HIKAYETA SÎ Û ŞEŞÊ

Rojekê Îskender gote haziran, "Qet kesekî min mehrûm nekirîye. Her kesek ku tiştek ji min çi xostîye min bexşîye." Merifek wê weqtê îfade kir ku, "Ey xwendekar ji bo min dirhemek lazim tu îhsan bike." Emir kir ku, "Ji xwendekaran tiştê edna[33] xwastin bê edebî ye." [51b] Ewî merifî got, "Eger ku ji xwendekaran ji dayina dirhemekê şerm têtin, milkê welatekî bibexş." Îskender got, "Berê te kêm ji merteba min xwast. Û paşê jî te zêde ji merteba xo ji min xwast. Di her du xwastinan jî bê mehel bûyî." Ew merif bê cewab şermî bû.

31 Peyamber. Xeberdox.
32 Şaşik. Serpêç.
33 Asta gelekî nizm.

HIKAYETA SÎ Û HEFTÊ

Xwendekarek ji qeşmerekî êşîya. Emir kir ku, “Bavêne binê pîyê fîlê.” Qeşmer jî zarî kir ku, “Ey xwendekar, ez ze’îf im. Layiqî binê pîyê fîlê nînim. Min bavêje bin pîyê ‘efûyê. Wezîr bavêje binê pîyê fîlê. Lewra wezîr [52b] qelew e. Hestikêd wî di bin pîyê fîlê jî naxoze di pîyan biçe.” Xwendekar bi kenarê wezîrî fikirî û kenî û got, “Çi dibêjî?” Wezîr îfade kir ku, “Ji bo Xudê cirma vî heramzadeyî bibexş, û ger ne, min jî dixwaze bavêje belayê.” Ji xwendekarî xebera qeşmerî û rîca wezîrî xoş hat û ji qisûra wî ‘efû kir û xelat bexşî.

HIKAYETA SÎ Û HEŞTÊ

Şêrekî û merifekî di xanekê da her duwan sûretêd xo dîtin. Merifî gote şêrî, “Dibînî ku şeca’eta insanî ku şêr zebûn kirîye. Şêrî [53b] got, “Ostayê wî benî adem e. Şêr osta bûya wekî wî nedibû.”

HIKAYETA SÎ Û NEHÊ

Merifek çû nik katîbî û got, “Xetekê binivîs.” Got, “Pîyê min dêşe.” Wî merifî got, “Naxwazim bişînim cîhekê, wuha ‘ozran tînî.” Cewab da ku, “Ev xebera te rast e, lakin her çi weqtê ku ji bo kesekî nivîsarekê bikim ji bo xwanda wê min dixozin dibin kesekî dinê, nikare bixwîne bixeyr ji min, lewra dibêjim.”

[54b] HIKAYETA ÇİLÊ

Merifek nivîsarek dinivîsî. Û merifek bîyanî jî li nik wî rûniştî bû. Di kenarê nivîsarê didî. Ewî merifî di nivîsarê da nivîsî ku, “Merifekî bîyanî û ker li nik min rûniştîye û nivîsarê jî dixone. Ji bo vê sebebê qet sirrekê nanivîsim.” Ewî merifî got, “Çira min ehmeq zen dikî û çira sirran nanivîsî? Min nivîsara we ne xondîye.” Nivîsende got, “Eger te nivîsara min ne xondîye, bi çi me’lûm kir ku min wuha nivîsîye?”

HIKAYETA ÇİL Û YEKÊ

Rojekê bazî gote dîkî ku, “Zehf [55b] bê wefa yî, merif te xoyî dikin û ji bo te xanî çêdikin. Wekî dixwazin ku te bigirin çira tu direvî? Eger çî ez teyrê bejî me, lakin çend rojekê ku ji destê merifan loqme dixom, ji boy wan nêçîrê dikim. Û her çiqasî ku dûr jî biçim, wekî gazî dikin bişûve dîsan têm.” Dîkî cewab da ku, “Te qet baz li serê şîşê dîye, min zehf dîk li ser şîşê kebab dîye. Û zehf dîk li ser agirê biryan dîye. Tu jî zehf dûr direvî, eger bazekî li ser şîşê bibînî.” Baz bêcewab bû.

[56b] HIKAYETA ÇİL Û DUYÊ

Melayek nedîmê xwendekarekî bû, ku mû û rihê xo dikêşand. Rojekê xwendekar gote wî, “Eger rojekê dinê jî tu mû û rihê xo bikêşîne dixozim sîyaset li te bikim.” Paşî çend rojekan mela şuxlek kir ku xwendekar zehf li ber wî mihebbet bû û gote wî ku, “Her çi ku bixozî dê bibexşînim te.” Mela got ku, “Rihê

min bibexşîne. Min bi xeyr ji wê qet nexwazim." Xwendekar kennî û got, "Eger xoşîya te di vê da ye min bexşî."

HIKAYETA ÇİL Û SÊYÊ

Kirêdrûyek çû nik hekîmekî [57b] û got ku, "Li ber kirêdtirî cîhekî min pizûkek hatîye, dermanekê bide." Hekîm li rûyî fikirî[34] û got, "Derew dibêjî. Rûyê te dibinim, li wê qet pizûk nîne."

HIKAYETA ÇİL Û ÇARÊ

Merifekî gote xulamê xo ku "Sûbeyê zû eger qijikê li cîhekê rûniştî dibînî, ji me ra xeber bike ku ez dixwazim bibînim û kêfekî xoş dixozim bibînim." Temamê wê rojê bixoşî dixoze bibore. Hasilî, xulam du qijik dî bi hev ra. Xeber da axayê xo. Axayê wî wekî biderve hate der. [58b] Qijikek dît, qijika dinê jî firî bû. Zehf li xulamî 'errinî û bi qemçî lêdan girt. Hema wê weqtê dostekî ji boy wî zad verêkir. Xulam anî û nîşan da ku "Ey axa, te qijikek dî, ji bo te te'am hat. Eger te du qijik bidîya te jî ew didî ku min dît."

HIKAYETA ÇİL Û PÊNCÊ

Hekîmek her çiqas ku diçû qebrîstanê çarik[35] li serê xo digirt. Merifan ji wî pirsîyar kir ku, "Çi sebeb e?". Got ku, "Ji merifêd qebrîstanê şerm dikim. [59b] Lewra ku ji dermanê min mirine."

HIKAYETA ÇİL Û ŞEŞÊ

Rojekê xwendekarekî zalim bitenê ji bajêr bi derve çû. Merifek li binê darekê rûniştî dît. Pirsîyar kir ku, "Xwendekarê vî milkî çawan e? Zalim ya 'adil e?" Got, "Zehf zalim e." Xwendekar got, "Min dinasî?" Got, "Na" Xwendekar got, "Ez im xwendekarê vî milkî." Ew merif tirsîya û got, "Tu jî min dinasî?" Xwendekar got, "Na." "Kurrê filan bazirganî me. Her mehê sê rojan dîn dibim. Îro yek [60b] roj e ji sê rojan." Xwendekar kenî û qet negot.

HIKAYETA ÇİL Û HEFTÊ

Şa'irek çû nik maldarekî û zehf ew medh kir. Maldar jî zehf xoşhal bû û got, "Li nik min diraf nîne, lakin zewadê zehf eger sûbe bêyî didim." Şa'ir çû mala xo. Weqtê fecrê bişûve hate nik bazirganî pirsîyar kir ku, "Ji boy çi hatî?" Got, "Dûhûnî te we'da dayina zewadê kir. Ji bo vê sebebê hatim." Maldar got [61b] ku, "'Ecêb ebleh î. Te ez ji xeberan xoş kirim. Min jî tu ji xeberêd xoş zahir kir. Niha zewade ji bo çi bidim?" Şa'ir jî şermî bişûve çû.

HIKAYETA ÇİL Û HEŞTÊ

Feqîrekî cirmekî mezin kir. Birine nik hebeşê kotûwal. Kotûwal jî hikim kir ku "Rûyê feqîrî reş bikin û di nêv temamê bajêr bigerînin." Feqîr got, "Ey kotûwal,

34 Di wateya "nihêrîn"ê de tê bi kar anîn.
35 Dersok. Şaşik. Kefî.

nîvê ruyê min reş bike û gerrîna hemû merifêd bajêr, dixwazin bizanin ku hebeşê kotûwal [62b] heme." Kotûwal[36] ji vê xeberê kennî û qisûra feqîr bexşî.

HIKAYETA ÇİL Û NEHÊ

Korek di şevekî tarî da çira di dest û cerr[37] li ser milî girtî di sûqê diçû. Merifekî ji wî pirsîyar kir ku, "Ey ehleh, şev û roj di çavê te yek e. Ji çirayê ji bo te çi fayîde heye?" Kor kennî û got, "Ev çira ji boy min nîne. Hetadi şeva tarî tu cerrê min neşkînî."

HIKAYETA PÊNCÎHÊ

Feqîrek çû dikana beqalekî [63b] û di kirrîtinê lez kir. Beqal jî bi feqîrî çîr kirin da û feqîr 'errinî û solek li sere beqalî da. Beqal jî çû nik kotûwal û nalî. Kotûwal jî ew feqîr xwast û pirsîyar kir ku, "Çira te beqal kuta?" Feqîrî got ku, "Beqal çîrrê min kir." Kotûwal got, "Ey feqîro, te qisûrekî mezin kirîye, lakin feqîr î. Ji boy wê ji te ra sîyaset[38] nakim. Here heşt hejîran bide beqalî. Ceza qisûra te ev e." Feqîrî rub'îyeyek ji kûrika[39] xo bideranî û bi [64b] destê wî destê kotûwalî û solekê jî li sere kotûwal da û got, "Eger 'edil ev e heşt hejîran tu bistîne û heşt hejîran jî bide wî."

HIKAYETA PÊNCÎ Û YEKÊ

Misewwirek[40] çû bajarekî û li wê derê dest bi hekîmîyê kir. Paşî çend rojekê merifek ji wetenê wî hate wî bajarî û ew dît û pirsîyar kir ku, "Ev çi hal e dikî?" Got ku, "Hekîmî." Pirsîyar kir, "Ji boy çi?" Got, "Ji boy wê ku, eger di vê pîşeyê da qisûrekê bikim xwelî wê setir[41] dike."

[65b] HIKAYETA PÊNCÎ Û DUYÊ

Şa'irekî feqîr çû nik maldarekî wusan nêzûkî wî rûnişt ku mabeyna şa'irî û maldarî ji bostekê zêde nebû. Maldar jî ji boy wê sebebê 'errinî[42] û rûyê xo jê tirş kir. Û pirsîyar kir ku, "Di mabeyna te û kerê çi ferq heye?" Got ku, "Bi qederê bostekê." Maldar ji vê xeberê zehf şermî bû û 'ozir xwast.

HIKAYETA PÊNCÎ Û SÊYÊ

Sûalkerek çû biderê maldarekî [66b] û sual kir. Ji hunduro malê jî cewab hat ku, "Sitê[43] di mal da nîne." Sûalkerî got, "Parîkî nanî min sûal kir, min sitê ne xwast ku eve cewabê didî."

---

36 Hakim, Dadger. Kelîmeyeke Farsî ye, ku di heman deme de di wateya "hikimdar" de jî tê bi kar anîn.
37 Kûz. Şerbik.
38 Di wateya "cezakirinê" de tê bi kar anîn.
39 Çaket. Kaput. Sako
40 Ressam. Wênesaz.
41 Veşartin. Nepenîkirin.
42 Sil bûn.
43 Jin. Xanim.

HIKAYETA PÊNCÎ Û ÇARÊ

Xwendekarekî melayekî gazî kir û got, "Dixozim ku te bikim qazîyê vî bajarî." Melayî got, "Ez layiqî vî şixulî nînim." Pirsîyar kir ku, "Çira?" Cewab da ku, "Ewê ku min got eger rast e min me'zûr bidêre, û eger ne, min derew gotîye. Paşê, merifê derewîn qazîkirin layiq nîne." Xwendekar [67b] 'ozra melayî qebûl kir û ew me'zûr dêra.

HIKAYETA PÊNCÎ Û PÊNCÊ

Rojekê mîrekî tîr diavête armacê[44]. Li wê derê zehf amaççî jî hazir bûn. Tîra kesekî ne digîha amacê. Feqîrek çû wê derê û ji mîr tiştek xwast. Mîrî, tîrê kevanê xo da destê feqîrî û got, "Biavêje armacê û lê de." Feqîr jî tîr havête amacê rastgele lê da. Mîr zehf kêfxoş bû û sed rub'îye bexşî feqîrî û destûr da. Feqîrî gote mîrî, "Min sûal kir qet te ne da." [68b] Mîr rûyê xo kêşa û got ku, "Sed rub'îye min bi te bexşî, dibêjî min tiştek nedî. Ev çi xeber e?" Feqîrî got, "Sed rub'îye armacê lê da min, girt û ji sûalê min çi dît?" Kenî û îhsenekî dinê bexşî.

HIKAYETA PÊNCÎ Û ŞEŞÊ

Şevekê qazî di kitêbê da dî ku her çi ku serî biçûk û rih dirêj bidêre ew jî ehmeq dibe. Qazî jî ser biçûk û rih jî zehf dirêj bû. Digel xo got ku, "Serî biçûk kirinê nikarim, lakin rihê kurt kirinê dikarim." Meqes jî anî [69b] di kirmêkirinê ne dî. Naçarî nîvê rîyan di dest xo girt û nîvê berê nikê çirayê wekî şemalê girte mûyan. Germî gîha destêd wî. Rîhê xo berda. Hemû jî rihê wî şewitî. Qazî jî zehf şermî bû, bi sebebê wê ku her çi di kitêbê da bû, sabit bû.

HIKAYETA PÊNCÎ Û HEFTÊ

Rojekê xwendekarek li ser banê qesra xo rûniştî bû. Merifekî dît ku li binê dîwêrî rûniştîye, teyrek di dest girtîye nîşan dide. Xwendekar ew teleb kir û pirsîyar kir, [70b] "Ji boy çi teyrê nîşanî min didî?" Got, "Ey xwendekar, digel merifekî ji kenarê hezreta we min şert kir û ev teyre di leyzê da ji boy xwendekar min anî. " Xwendekar şa bû û teyr jî şande aşxanê. Û paşî du û sê rojan ew merif dîsan bişûve hate nik xwendekar û bizek anî nik xwendekar û got, "Ji navê hezreta we ew jî di leyzê da min dî." Xwendekar ew jî wuha qebûl kir. Cara sêyê dîsan çû nik xwendekar û merifekî dinê digel xo bir. Wekî xwendekar ew destvala dî pirsîyar kir ku, "Te ji boy min qet ne anîye?" Îfade kir ku, "Ji kenarê hezreta we digel vî merifî [71b] du hezar rub'îye şert kirime û leyiz jî ne hate min. Niha ev merifa ji boy zêran hatîye hezreta we." Xwendekar kenî û zêr bexşîne wî. Û emir kir ku, "Paşê ji kenarê min digel kesekî qumarê melîze. Deha qet ji te naxozim bigirim û ne tiştekê jî bi te nadim."

44 Hedef.

HIKAYETA PÊNCÎ Û HEŞTÊ

Merifekî di xewnê da digel Iblîs milaqat kir. Sîleyekê li rûyê wî da û rihê wî girt û got, “Ey le’în, tu dijminê min î û ji boy xarandina me merifan rih dirêj didêrî.” [72b] Û sîleyekî dinê li rûyê wî da. Hişyar bû û rihê xo di destê xo da dî. Şermî bû û li ber xo kenî.

HIKAYETA PÊNCÎ Û NEHÊ

Merifek çû nik derwêşekî û sê sûal kirin. Ê berê ew ku, “Çira dibêjî ku Xudêyê me li hemû cîhan hazir e, qet li cîhekî nabînim. Nîşan bide li ku ye.” Ê duyê ew ku, “Ji boy benî ademan ji boy teqsîrê çira sîyaset dikin? Her çi dike Xudê dike. Ji boy benî ademî qet qudret nîne. Û bê emrê Xudê qet nikare bike. Û eger qudreta benî ademî bûya hemû şixulan ra jî [73b] ji boy xo çêtir dikir.” Ê sêyê ku, “Xudê bi Iblîsî agirê dojeyê çawan dikare ‘ezeb bide, ku Iblîs ji agirê kirîye? Û agir jî li agirê çi eser dixoze bike. Lewra ku eslê wî ji agirê ye. Û agir di agirê çi eserê dixoze bike?” Derwêş kêsekekî mezin li serê wî da û merif bi girî çû nik qazî û got, “Ji filan derwêş min sê sûal kir, li serê min wusan kêsekek lê da ku serê min dêşe û cewab neda.” Qazî jî derwêş teleb kir û got, “Çira te kêsekek li serê vî da û cewaba sûala wî ne da?” Derwêş go, “Ew kêsekek hemîn cewaba sûala wî bû ku min da. [74b] Ewe dibêje ku, serê min diêşe. Bilanî nîşan bide ku li kîderê ye. Ejî Xudê nîşanî wî bidim. Û ji boy çi li nik hezreta we nalî? Her çi ku li wî kirîye, Xudê kirîye. Min bê îradeta Xudê li wî ne da. Ji boy min çi qudret heye. Bê îrade lê dan. Û ew jî bi xo ji xwelîyê ye. Bes ji xwelîyê ew çawan zererê dibîne?” Ew merif şermî bû û qazî cewaba derwêşî zehf meqbûl dêra.

HIKAYETA ŞÊSTÊ

Siwarek hate bajêrekî û bihîst ku li wê derê diz zehf in. Weqtê şevê gote mêterî[45], “Tu razê, ez dixozim ku hişyar bimînim. [75b] Lewra bawerîya min bi te nîne. Mêterî got, “Ey axa, ev çi xeber e. Ez begen nakim ku ez di xewê da bim û axayê min hişyar be. Ez esla wuha nakim.” Hasilî, axayî raza û paşî miqdarekê şevê hişyar bû gote mêterî, “Çi dikî?” Got, “Di fikrê da me ku Xudê ‘erd çawan li ser evê raxist.” Got ku, “Ditirsim ku diz bên û tu xeberdar nebî.” “Ey axa, tu rahet be. Ez xeberdar im.” Ew siwar dîsa raza û nîvê şevê hişyar bû û pirsîyar kir ku, “Ey mêter çi dikî?” Got ku, “Di fikrê de me ku Xudê ‘esman çawanî [76b] bê istûn daye sekinandinê.” Got ku, “Ji fikra te ditirsim. Mebe ku diz hespê me bibin?” Got ku, “Ey axa, hişyar im, çawanî diz dikarin bibin?” Siwarî got, “Eger razanê dixozî razê. Ez hişyar im, tu dixozî razê.” Got, “Xewa min nayê.” Siwar dîsan raza. Wekî sa’etek ji şevê ma hişyar bû û ji mêterî pirsîyar kir ku, “Çi dikî?” Got, “Di wê fikrê me ku dizan hesp birîye sûbe zînî ez li ber serê xo dê bibim, yanî axa dibe.”

45 Seyîsê hespan.

HIKAYETA ŞÊST Û YEKÊ

Derwêşek çû nik bexîlekî[46] û tiştek jê sûal kir. Bexîlî got, "Eger xeberekê jî [77b] ji min qebûl bike her çi bibêjî dixozim bikim." Derwêş pirsîyar kir ku, "Ew xeber çi ye?" Got, "Tiştekê ji min mexoze bi xeyr ji wê, her çi dibêjî bikim."

HIKAYETA ŞÊST Û DUYÊ

Mirofekî digel bexîlekî dostî hebû. Rojekê gote bexîlî ku, "Niha diçim seferê. Xatema[47] xo bide min. Ewê digel xo dixozim hifz bikim. Her çi gava ku ewê dibînim te tînim bîra xo." Cewab da ku, "Eger dixozî min bînî bîra xo, her çi gava ku tilûya xo vala dibînî min bîne bîra xo ku ji filanî min xatem jê [78b] xwastibû û ne dayîbû."

HIKAYETA ŞÊST Û SÊYÊ

Melayek çû bajarekî bihîst ku di wî bajêrî merifekî xoyî sexawet[48] zehf didêre û zad dide mêvanan. Mela jî digel parçenê kevin û perîşan çû nik ewî merifî. Qet guh ne da û cîhê rûniştinê jî neda. Mela şermî bû û bişûve hat. Roja dinê lîbasnê qenc û paqij bi kirê girt û ragirt, çû nik wî. Xoyê malê îkram kir û li nik xo danî. Û zadê bilezzet ji boy wî xwast. Mela ku li ber zadî rûnişt parî jî li ber lîbasêd xo soyin[49] girt. Paşê [79b] xoyê malê pirsîyar kir ku, "Çiranî wuha dikî?" Got, "Dihûnî jî digel lîbasêd kevin ez hatibûm. Qet zad min ne dî. Îro ku digel lîbasêd qenc hatim, ez zen dikim ku ev zada ji boy van parça ne, ne ji boy min e." Ew merif şermî bû û 'ozr xwast.

HIKAYETA ŞÊST Û ÇARÊ

Xwendekarek tabûrek şehande[50] bir serê dijminan. Ew tabûr şikest dî. Merifekî çelenk hat enik xwendekar û xeber anî ku, "Tabûra we qenc û zefer dî." Paşî du rojan cewab hat ku bi 'eks bûye. Xwendekar li wî merifî sîyaset kirin xwast. Îfade kir ku, [80b] "Ey xwendekar, ez sezayî sîyasetê nînim. Lewra ku du rojan min tu şad kir. Tu çira min nexoşî dikî." Xwendekar ev letîfe begen kir û îhsan emir kir.

HIKAYETA ŞÊST Û PÊNCÊ

Xwendekarek ji mineccimekî pirsîyar kir ku, "Çend sal ji 'emrê min baqî maye?" Got, "Deh sal." Xwendekar zehf milahaze kir. Wekî nexoşan kete ser doşekê. Wezîr pirsîyar kir. Zehf 'aqîl bû. Mineccim jî rûbirûyê xwendekar teleb kir û pirsîyar kir ku, "Çend salan 'emrê te baqî ye?" Got, "Bîst salan." Wezîr heman wê weqtê [81b] bi şûrî li nik rûyê xwendekar ew mineccim qetil kir.

46 Çavnebar. Kumreş. Qesîs.
47 Gustîl.
48 Comerdî. Camêrî. Çavfireyî.
49 Tê de kirin. Tê ra kirin.
50 Leşker.

Xwendekar xoşnûd kir. Û hikmeta wezîr pesinî û paşê xebera qet mineccimekî ne bihîst.

HIKAYETA ŞÊST Û ŞEŞÊ

Merifek birsî diçû, 'Erebekî dî ku li ber kenarê hewizekê zad dixo. Çû nik wî û got, "Ji terefê mala we têm." 'Erebî pirsîyar kir ku, "Jin û zaro û deveyêd min hemû jî silamet in?" Got, "Belê." Ji 'Erebî tesellî bû. Û paşê li wî merifî nihêrî û got, "Ey 'Ereb, ev seya ku li hizûra te niha rûniştîye eger [82b] seyê te xoş bimaya wuha dibû." 'Erebî serê xo bi jor ve kir û got, "Seyê min ji boy çi mir?" Got, "Goştê deveyê te zehf xwar." Got ku, "Deve çawanî mir?" Got ku, "Jina we mir, wê sebebê kesekî ew xoyî ne kir û xurek û av ne da." Pirsîyar kir ku, "Jina min çawanî mir?" Go, "Di xema kurrê te zehf girî û kevir li sere xo û sîngê xo da." Pirsîyar kir ku, "Kurrê min çawanî mir?" Got, "Xanî li ser wî ket." 'Erebî wekî ev ehwala xanî xebera bihîst, xolî li serê xo kir û zad jî wusanî hêla û bi kenarê mala xo jî rewane bû. Ewî merifî jî [83b] bi vê hikmetê te'am bi destê xo kir.

HIKAYETA ŞÊST Û HEFTÊ

Bexîlekî gote dosteki ku, "Hezar rub'îye li nik min heye. Dixozim ku evan rub'îyeyan bi derî bajêr çal bikim û bi xeyr ji te evî sirrî nabêjim." Hasilî, ew her du bider ve çûn û di binê darekê da diraf çal kirin. Paşî çend rojekan bexîl bi tenê hate binê darê. Ji dirafê qet eser ne dî. Got ku, "Bi xeyr ji wî dostê min kesekî dinê ne birîye, lakin eger ji wî bipirsim esla îqrar nake." [84b] Paşê çû mala wî û got, "Zehf diraf bi dest min ketîye. Ez dixozim ku wuhanî li wê derê daynim, lakin eger sûbê bêyî digel hev biçin." Dostê bi tema'a dirafê zehf, ew dirafê birî li wê derê bişûve bir danî. Bexîl roja dinê bi tenê çû wê derê û dirafê xo dît. Hikmeta xo bi ken kir. Û paşê li ber dostîya dostan bawer nekir.

HIKAYETA ŞÊST Û HEŞTÊ

Du neqqaşan digel hev gotin ku, "Em her du, du sûretan teswîr bikêşim bibînim kîjan qenc dikêşe?" Misewwirekî oşîyekî[51] tirî neqş kir [85b] û ew li ber derê wî hilawist. Teyran hatin û li wê mînqar lê dan. Merifan ew suret jî zehf begen kirin. Û çûne mala misewwirê dinê û pirsîyar kirin ku, "Li kî derê te suret kêşaye?" Got, "Di pişt vê perdeyê." Misewwirê berê xwast ku perdeyê hilîne. Wekî destê xo bir ku perdeyê bibîne me'lûm kir ku perde nîne. Belku dîwar e ku li ser wê sûret kêşaye. Misewwirê dinê got ku, "Te wusan suret kêşaye ku teyr xapîyane û min wusa sûret kêşaye ku misewwir xapîyabe."

HIKAYETA ŞÊST Û NEHÊ

Rojekê merifekî digel xo got ku, "Her çi ku [86b] 'erd û asman e, hemû ji boy min e. Xudê ez zehf mezin xelq kirime. Li wê navê kermûşek li ber kepê wî

51 Goşî. Weşî. Hûşî.

rûnişt û got, “Ji te ra wuha xirûr layiq nîne, lewra ku her çi di ‘erd û esmanê da ye, Xudê ji boy te xelq kirîye. Tu jî ji boy min. Nizanî ku ji te mezintir im.”

HIKAYETA HEFTÊ

Xwendekarekî emrî heddadekî[52] kir ku, “Zirhekî qenc ji boy min hazir bike.” Heddadî jî hazir kir anî nik xwendekar. Xwendekar jî bi meqseda tecribeyê danî ‘erdê [87b] û şûr li wê da, du ker bû. Emrî heddadî kir ku, “Eger paşê dîsanî wuha zirh dixozî çêkî, serê te jî dixozim du keran bikim.” Heddad çû mala xo. Keçek hebû, ev ehwala jî digel wê got. Keçikê jî wuha meslehet[53] dît ku, “Dîsan zirhê çêke. Vê carê ez dixozim ku bibim nik xwendekar.” Hasilî, heddad zirh çêkir. Û keçika wî ew zirh wergirt û şûrek jî di dest girt û çû nik xwendekarî û îfade kir ku, “Niha li zirhê bifikirin.” Xwendekar, “Ji boy çi te eva wergirtîye?” Got, “Ey xwendekar izin bide. [88b] ‘Adet ew e ku zirh li ser wicûdê tête tecribe kirin. Ji boy vê sebebê min wergirtîye.” Xwendekar ev xebera bi ken kir û îhsan bexşî.

HIKAYETA HEFTÊ Û YEKÊ

Rojekê xwendekarek digel wezîrê xo ji boy seyranê çû. Gîhane mezrayekê darêd genimê dî ku ji bejna benî ademan dirêjtir. Xwendekar ‘ecêb ma û got, “Wuha dirêj qasilê[54] genimê wekî bejna fîlê bilind û dirêj dibin?” Xwendekar kenî wezîr digel xo got ku xwendekar [89b] xebera wî bi derew zen kir lewra ku kenî. Wekî ji seyranê bişûve hatin mektûb bi merifê welatê xo ji boy çend qasilê genimî hatin û şandinê verêkir. Mektûb gîha wê derê. Weqtê genimî borî bû. Hasilî, paşî salekê qasilêd genimî ji wê derê jî gihîştin. Wezîr bire pêş xwendekar. Xwendekar jî pirsîyar kir ku, “Çira te anî?” Îfade kir ku, “Sala borî rojekê min îfade kiribû ku qasîlê genimî weku bejna filan bilind dibin. Hûn kenîn, Min digel xo got ku, xebera min we derew zen kirin. Ji boy tesdîqa xebera xo min anî.” Xwendekar got, “Niha [90b] min bawer kir, lakin emanet li ber kesekî wuha xeberan nebêje ku paşî salekê bawer bike.”

HIKAYETA HEFTÊ Û DUYÊ

Dizek ji boy dizîna hespekê çû cîhê merifekî. Rastgele ew hate girtin. Xoyê hespê gote dizî, “Eger hikmeta dizîyê hespê bi min hûrî bikî, ez te jî azad dikim.” Diz jî qebûl kir û çû nik hespê û ben ji istûyê wê vekir. Paşê wê gem kir. Paşê li hespê siwar bû û ajot û gote xoyî ku, “Bibîne wuha dizî dikin.” Merifan her çiqasî li pey çûn ne dîtin.

52 Hesinker.
53 Bejewendî. Fêde.
54 Qesîl. Gîyayê genim û ceh yê teze yê ku hîn simbil negirtine.

[91b] HIKAYETA HEFTÊ Û SÊYÊ

Merifek zehf muflîs bû. Hespek jî hebû. Ew di pagê[55] da girêda. Lakin kenarê ku serê hespan dibe, dûvê wê bi wê terefê kir. Û dellal da gazîkirin ku, "Merifno temaşayekî 'ecêb bibinin, ku serê hespê li cîhê dûvê ye." Hemû merifêd bajêrê berhev bûn. Her merifekî ku ji boy temaşayê çû hundûroyê pagê, dixost ku ji wî qederekî diraf bistîne. Digirt û rê dida wî. Her çi kesekî ku diçû wê pagê, paşê şermîbûyî wuha ji wê pagê biderve dihatin. Û qet kesek jî ne digot, ku[56].

[92b] HIKAYETA HEFTÊ Û ÇARÊ

Merifekî ji Eflatûn pirsîyar kir ku, "Salêd zehf di gemîyê bûyî û sefera behrê kirî. Di behrê da te çi xerayîb[57] dî?" Got, "Ev xerîb e ku ji behrê bi silamet bi kenarê gihîştim."

HIKAYETA HEFTÊ Û PÊNCÊ

Ji boy xwendekarekî wezîrekî 'aqîl hebû. Destê xo ji wezîrîyê kêşa û bi te'eta Xudê meşxûl bû. Xwendekar jî ji emîran pirsîyar kir ku, "Wezîr li ku ye?" Îfade kirin ku, "Ji wezîrîyê dest kêşaye, bi te'eya[58] Xudê meşxûl bûye." Xwendekar çû nik [93b] wezîri û pirsîyar kir ku, "Ey wezir, ji min we çi qisûr dît ku wezaret te terk kirî?" Got, "Ji boy penc sebeban. Ewilî ew e ku, tu rûnîştî bûyî ez li hizûra te li pîyan dimam. Niha xizmeta Xudê dikim ku di weqtê nimêjê jî izna rûniştinê daye. Ê duyê ew e ku, te zad dixor û min nezer dikir. Niha rezaqekî peyda kirim ku ew naxû û bi min dide xorin. Ê sêyê ew e ku, tu radizayî û min bekçîtî dikir. Niha Xudêyekî didêrim ku ez radizêm û ew ji boy min bekçîtî dike. Ê çarê ew e ku, dayîma ez ji te ditirsam. Eger tu bimirî ji boy min [94b] ji dijminan bela bigihêşe. Niha wusan Xudêyekî didêrim ku naxoze bimire û ji boy min jî ji dijminan qet bela nayê. Ê pêncê ew e ku, ez ji te ditirsim ku eger ji min cirmek bêbe ne bexşî. Niha Xudêyekî heye ku wusanî bi rehm e ku her rojê sed gunehan dikim dibexşîne."

HIKAYETA HEFTÊ Û ŞÊŞÊ

Rîwayet dikin ku Siltan Mehmûd ji Êyaz zehf dost didêra. Ji vê sebebê hemû mûqariban[59] ji wî hesed dibirin. Û gotine xwendekar ku, "Êyaz her rojê bi tenê diçe [95b] xezînexaneyê. Me'lûm dibe ku tiştekê didize. Eger wusa nebe ji boy wira di xezîneyê çi şixul e?" Xwendekar got, "Her gava ku ez bi xo bi çavê xo nebinim bawer nakim." Rojekê dinê xeber dane xwendekar ku, "Êyaz çûye xezînexaneyê." Xwendekar jî ji derîçeyê nezer li hundûroyê xezîneyê kir ku çi dibîne, ku Êyaz sîndoqek vekirîye cilekî kevin û jinde wergirtîye. Xwendekar çû

55 Axur.
56 Kî.
57 Pirjimara kelîmeya xerab.
58 Te'et. Perestin.
59 Kesên nêzîk. Heval û hogir. Xizm.

hundûro û pirsîyar kir ku, “Çira tu wuha lîbasê kevin wergirtîye?” Îfade kir, “Êy xwendekar, wekî li xizmeta hezreta we nebûm, min wuha lîbasê kevin didêra. Niha ji dewleta xwendekar parçenêd [96b] faxîre didêrim. Cilêd xoyî kevin jî her rojê dibînim wer dikim. Hetaku halê xoyî berê jî ji bîr nekim û qedrê ne’meta xwendekarî binasim.” Xwendekar wekî ev cewab bihîst bi ken kir û ew êna nik xo û mertebeya wî mezin kir.

HIKAYETA HEFTÊ Û HEFTÊ

Di exlaqê Erdeşîrê Babekan hatîye, ku ji hekîmekî ‘Ereb pirsîyar kir ku, “Her rojê çi mîqdar zad lazim e xorin?” Got, “Sed dirhem kîfayet dike.” Got ku, “Ew qeder çi qewet dide?” Got, “Ew miqdar te lipêyan didêre û her çi ku ji wê [97b] zêde bikî tu hemalê wê yî.”

HIKAYETA HEFTÊ Û HEŞTÊ

Yekî ji hekîman kurrê xo ji zehf xorinê men’ dikir ku, “Têrî, merifî nexoş didêre.” Got, “Babo, birsîtî jî dikuje te, te ne bihîstîye ku gotine? Bi têrî mirin qenc e ku birsî bibî.” Got, “Endazeyê[60] hifz bike. Xudê gotîye, bixû vexû lakin îsrafê meke.”

HIKAYETA HEFTÊ Û NEHÊ

Dest û pêbirê yekî hezar pê kuşt. Ehlûllahekî li wî borî û got ku, “Xudayê mezin, [98b] digel hezar pêyî ku hebû, wekî ecel hat gîha, ji bê dest û pêyekî nikare bireve.”

HIKAYETA HEŞTÊ

Ji boy sûdagerekî hezar zêr zîyan bû. Gote kurrê xo, “Lazim nayê ku vê xeberê ji boy kesekî bibêjî.” Kurrî got, “Babo, emre te ye, nabêjim. We lakin ji boy me ra ji wê çi fayîde. Li wê min metla’[61] bike ku fayîde di xef kirinê çi ye?” Babî got, “Heta ku bela me dudu ne be. Yek çûna malî û noqsanîya sermayeyê û şabûna dijminan.”

HIKAYETA HEŞTÊ Û YEKÊ

Ji şa’iran yek çû nik mîrê dizan [99b] medh got. Emir kir ku, cilêd wî bistînin. Û ji gundî biderve kirin. Seh ketine pê wî. Xwast ku kevirekî hilîne. ‘Erd jî cemidî bû. ‘Aciz bû got, “Ev çi heramzade merif in ku seh vekirine û ‘erd jî wuhanî girêdayine.” Mîr ji şibakê bihîst û kenî û got, “Ey hekîm, ji min tiştekê bixoze.” Got ku, “Cilê xo dixozim, eger îhsan dikî.”

HIKAYETA HEŞTÊ Û DUYÊ

Merifekî çav êşî girt. Çu nik beytarî go, “Min derman bikî.” Beytar jî ji dermanê ku dikêşa çavêd çarpêyan di çavê [100b] wî kêşa. Kor bû. Hikûmet birine pêş ‘edaletê got, “Here, qet nîne, eger ev ker nebûya ne diçû nik beytarî.”

60 Pîvan.
61 Hayidar kirin. Qani’ kirin.

HIKAYETA HEŞTÊ Û SÊYÊ

Xwendekarekî kurrê xo da me'limekî, ku eva kurrî wusanî terbîye bike ku wekî kurrekî ji kurrêd we bibe. Salekê li wî emek da û cîhê tiştekê ne girt. Û kurrêd melayî di fezlê kemalê da muntehî[62] bûn. Xwendekar gazî mela kirî. Mû'axeze[63] kir û got, "Te we'da xo xilaf kir û şertê wefayê bi cî ne anî." Got, "Ey xwendekar, terbîyet [101b] hemû yek e, we lakin qabilîyet mûxtelîf e."

HIKAYETA HEŞTÊ Û ÇARÊ

Kurrê maldarekî min dî ku li ser qebra babê rûniştî ye û digel kurrê feqîrekî mûbahese[64] dikirî. Daîma ku tabûta babê min bi qîymet e û nivîsara wî rengîn û kevirê mermer havêtine û acûr[65] ji fîrûzeyê çêkirine. Bi qebra babê te çawanî, dişibe ku acûrekî dû cem' kirine û mistekî du xolî li ser wê raxistine." Kurrê feqîrî ev bihîst û got ku, "Sûs be! Heta babê te jî ji binê vî kevirê giran rabe û xo bibîne babê min jî digihêje bihiştê."

ENCAM

Mela Mehmûdê Bazîdî di warê ziman, edebîyat û çanda Kurdî de xizmetên giranbuha kiriye. Girîngîya Mela Mehmûdê Bazîdî yê zana û piralî encax piştî ku zêdeyî sed û pêncî sal derbas bûye, yanî îroj tê famkirin. Her ku berhem û kiryarên wî dibin mijara lêkolînên zanistê, careke dinê derdikeve holê ku Bazîdî pêşengîya gelek cûreyên edebî di warê Kurdî de kirîye. Ji van cureyan yek jî wergernasî ye, ku bûye mijara vê xebatê.

Taybetmendîya destnivîsa Kurd 43'yê ya herî berbiçav, wekî metneke edebî, pirzimanîbûna wê ye. Metnên Farsî, Kurmancî û Fransî ligel hev hatine dayin û ji bilî vana tîpguhêzîya metnê Kurmancî jî bi Latînî hatîye nivîsandin. Em vê taybetî yan rêbazê, di warê destnivîskarîyê de gelekî nabînin.

Wergera ku Bazîdî wekî wergêrekî, di navbera Farsî û Kurmancî de ceribandîye, gelo çiqasî serkeftî ye? Berî sed sal û nîvekî qabilîyet û bêjedanka zimanê Kurmancî çiqasî dikarîbû Farsî îfade bikira? Ev her du pirsîyar ji bo dîrokçe û geşedana zimanê Kurdî gelekî girîng e. Berî ewqas sal di zimanekî de heger çalakîyên wergerîyê dest pê kiribin, ew wekî nîşana pêşdeçûna wî zimanî dikare bê qebûlkirin. Lê belê mixabin wiha tê xuyanê ku îro di destê me de metnên wergerê yên bo Kurmancî ne zêde ne.

62 Yê ku digihêje dawîya tiştekî û wê xelas dike.
63 Sil bûn. Rexne kirin. Azirandin.
64 Sohbet. Guftûgo.
65 Tûxla.

ÇAVKANÎ

AKTAŞ, Ş. (1998). *Roman Sanatı ve Roman İncelemesine Giriş*, Akçağ Yayınları, Ankara.

AYAN, G. (1991). "Mesnevi ve Kısa Hikâyecilik." *5. Milli Mevlâna Kongresi,* Konya, Selçuk Üniversitesi.

KAVRUK, H. (1998). *Eski Türk Edebiyatında Mensur Hikâyeler*, MEB, İstanbul.

KAVRUK, H. (2000). Mensur Hikâyeler, *Türk Edebiyatı Tarihi 1*, TC Kültür ve Turizm Bakanlığı Yayınları, Ankara.

PERTEV, R. (2014). "Tesîra Modernîzmê Li Ser Xebatên Pêşî Yên Folklora Kurdî-Tirkî", *Journal of University of Zakho,* Hj. 4, r. 12-24.

TANPINAR, A. H. (2000). "Roman ve Romancıya Dair Notlar", *Edebiyat Üzerine Makaleler*, Dergâh Yayınları, İstanbul.

TOSUN, N. (2017). *Doğu'nun Hikâye Kuramı*, Büyüyen Ay, İstanbul.

TÖKEL, D. A. (2000). "Zihniyet ve Kaynakları Açısından Hikâyemize Bakmak" *Hece*, S. 46-47, s. 42-52.

ÖZTÜRK, M. (2017). Koleksîyona Aleksandre Jaba Ya Destnivîsên Kurdî, Weşanên Lîs, Diyarbekir.

YAZICI, H. (1998). "Hikâye", *TDV İslam Ansiklopedisi*, C. 17, İstanbul.

Çavkanîyên Destnivîsî:

BAZİDÎ, M.M. (Bêdîrok). *Koleksîyona Aleksandre Jaba Ya Destnivîsên Kurdî*, No: Kurd 42, St. Petersbourg.

BAZİDÎ, M.M. (1868). *Koleksîyona Aleksandre Jaba Ya Destnivîsên Kurdî,* No: Kurd 43, St. Petersbourg.

PÊVEK:



Pêvek 1: Zerfa ku destnivîsa Kurd 43 ji aliye A. Jaba vê tê de hatîye parastin.



Pêvek 2: Di pêşîya destnivîsê de têbinîyên ku A. Jaba derbarê berhemê de nivîsîne.



Pêvek 3: Wereqa destnivîsê ya bi hejmara 1b'yê. Wekî tê dîtin, li hêlekê bi destxeta Bazîdî wergera çîrokên Farsî bo Kurmancî herfên Erebî heye û li hâla dinê jî tîpguhêzîya A. Jaba bi Fransî-Latînî heye.


I. (ou 1re Conte)
Histoire 1ère 1re Conte.
حکایت اول
Deux femmes se disputèrent
دو زن در طفلی منازعت میکردند وکواه
au sujet d'un enfant, sans
نداشتند هردو پیش قضی رفتند وانصاف
avoir des preuves, toutes
(de leur maternité)
خواستند قضی جلادرا طلبید وفرمودکه
les deux se rendirent devant
این طفل را دو پاره کن وبهر دو زن
le Cadi pour demander justice.
بده زنی چون این سخن شنید خاموشی
Le Cadi fit venir un bourreau et
dit: coupe cet enfant en deux
ماند وزن دیکر شور وفریاد اغاز کردکه
parties et partage les entre
برای خدا طفل مرا دونیم مکن اکر چنین
ces deux femmes.
En entendant
Ayant entendu ces paroles, l'une
انصاف است طفل را نی خواهم قاضی
testa muette, l'autre com-
mença à se désespérer et à
s'écrier;
au nom de Dieu, dit-elle, ne mets
بیقین پنداشت که مادر طفل همین است
point mon enfant en deux morceaux parties,
si telle est la justice, je ne veux
طفل را باو سپرد وزن دیکررا نازیانه
point de cet enfant. Le Cadi put
زده راند
se convaincre que c'était elle qui était
la vraie mère de l'enfant; il le lui fit
Histoire 2ème II
Remettre. Il remit, et renvoya
شخصی پیش پادشاهی رفت وعرض کردکه
l'autre femme après l'avoir punie fouettée
Une personne se présenta devant
le Roi en exposant que

Pêvek 4: Ev jî wereqeya 2a ye. Bazîdî di wereqên b'yê de jî bi destxeta xwe orîjînala metne, ku bi zimanê Farsî ne, istînsex kirîye û dû re jî Jaba ew wergerandine Fransî.